Di Kovara Guncel Huqûqê Jimara Çiriya Pêşîn 2009/10-70'an de û di Rojnama Radîkalê, 19-22 Çiriya Pêşîn 2009'an de hatiye weşandin.

VEBÛNA KURDÎ: DI PIRSA KURDÎ DE HUQÛQ Û EDLAHÎ*

Komara Tirkiyê ji damezrandina xwe heta niha bi pirsa kurdî re mijûl e. Rêvebirên welat ev pirsgirêka ku di 25 salên dûmahiyê de piranî wekî şerê çekdarî derketiye pêş, her dem xwestine ku bi polîtîkayên ewlekariyê çareser bikin. Lê eşkereye ku ev polîtîkayên han, ji çareserkirinê pirsgirekê wê de, pirsgirekê zêdetir tevlihev kiriye. Piştî ku hat dîtin pirsa kurdî êdî bi polîtîkayên emnahiyê naye çareserkirin, rêvebirên siyasî destpêkirin li riyên din geriyan. Ev pêvajoya ku berî niha bi navê "Vebûna Kurdî", dû re jî bi navê "Vebûna Demokratîk" li ser tê axaftin, divê bi vê nêrînê han ve bê nirxandin. Ji alî din ev pêvajo, ji ber ku aliyên din a pirsê, ango aliyên azadî, huqûqî û edlahiyê ya pirsê jî li ber raya giştî eşkerekir, girîng û biqîmet e.

Mirov dikare bêje ku du aliyê pirsa kurdî heye. Pirsa kurdî ji aliyekî ve pirsa demokrasiyê ye, ji alî din ve jî pirsa edaletê ye. Bi vî re girêdayî, yên ku dixwazin pirsê çareser bikin, divê hem ji bo pêşketin û bihêzbûna demokrasiyê û hem jî ji bo ku edaletekî giştî, ango ji bo ku herkes bikaribe jê sud bigre, hewlbide. Ji bo bihêzkirina demokrasî û pûçkirina bêedaletiyê jî, hem li Makezagonê û hem jî li zagonên din de hin tiştên ku divê bêrawestan bêne nirxandin û guherandin hene.

DI PIRSA KURDÎ DE PÊŞANIYÊN ZAGONA ESASÎ

Sedema pirsa kurdî berî her tiştî, bêparkirina mafên bingehîn ya demokratîk ên kurda ye. Bêparkirina kurdan vê pirsê derxistiye holê. Ji ber vê yekê ye ku pirsa kurdî pirsekî demokrasiyê ye. Heke pirsa kurdî ji kêmbûna demokrasiyê derketibe holê, ji bo çareserkirina pirsê jî divê demokrasî bi hemû dezge û nirxên xwe ve bête bikaranîn. Bi vê yekê re girêdayî, zagona esasiyekî nû ku di nav hîmên wî de wekhevî û azadî birûmet e, demokrasiyê derdixe pêş, esasên huqûqê ji bo herkesî wekhev dinirxîne û çandên cûda diecibîne, wê çareserkirina pirsê hêsantir bike. Di makezagonekî ku van hîman dinirxîne de; ango guherînên xalên destpêkê û mafê perwerdeya zimanî zikmakî jî tê de, mafên çandî, hemwelatî, beşdarbûna siyasî û rêvebirina herêmî dinirxîne, wê di çareserkirinê de rê li ber me veke.

Dema ku em li Tirkiyê xwestekên cûda yên der û dorên kurda ji ber çav derbas dikin, sê xwestekên girîng derdikeve pêşberî me. Vana jî ev in: Cîhgirtina mafê perwerdeya bi kurdî di makezagonê de, ji dêvla binavkirina hemwelatîbûnê ku di makezagonê de bi "tirkbûnê" ve hatiyê girêdan, binavkirinekî nû ku ji hemû nasnameyan re bi yek çavî dinhêre û bihêzkirina rêvebiriyên herêmî. Ji bo ku van daxwazana bêne bicîhkirin, pêwîstî bi baweriya çareseriyekî demokratîk re heye.

Di rastiya xwe de hatiye diyarkirin ku di çareseriyekî bi vî rengî de pênc hîmên esasî hene: (1) Redkirina layengiriya etnîkî, (2) naskirina pirçandeyetî, (3) mafên çandî, (4) rêvebirina xwenavendî û (5) bihêzkirina beşdariya demokratîk.[1] Ji vê çarçoveya çareseriyê re jî tenê makezagonekî ku li ser hîmên hemwelatiyên makezagonî hatiye damezrandin, bersîv dibe.

Di hîmên hemwelatiyên makezagonî de yên ku hemwelatiyan bi dewletê ve girêdide, ne hîmên olî an jî etnîkî ne; tenê hîmên demokratîk û sîvîl in ku her weha di makezagonê de jî hatine bicîhkirin. Ji ber vê yekê li zagona esasiyekî ku hemwelatiya makezagonî jî diecibîne, divê ji destpêkê heta dumahiyê ji nasandinên etnîkî û nasnameyî bê paqijkirin û rêzgirtina çandên cûda ku herweha bingeha civatê ye jî ji xwe re bingeh qebûl bike.

Destpêk: Zagonên esasî her dem daxwaza niwêneriya nirxên siyasî yên berfireh û xwestekên dilînî dike. Ev nirxên ku wekî mengiyên netewî têtе bikaranîn, di zagonên esasî de piranî li

* M. Sezgîn Tanrikulu, Abûqat, Endamê Baroya Diyarbekir.
[1] Mustafa Erdoxan, Çarçoveyekî Ji Bo Çareseriya Demokratîk, Rojnama Star, 29.08.2009

destpêkê de cîhê xwe digrin. Ev mengiyên makezagonî, girêdayî rejîma siyasî ye û ji demokrasî, azadî û dewleta serfiraz heta bi federalîzm û olê (Yên li Îslamê) xwe diguherîne.[2] Ji ber vê yekê ye ku destpêka zagona esasiyekî ku makezagona hemwelatiyê ji xwe re hîm girtiye, divê ji vê ray û ramanê durnekeve, cîh nede tu nêrînên etnîkî û olî, pirçandî û pirrengiya civatê nasbike, wan biparêze û wana wekî maldariyekî civatê binirxîne.

Hemwelatîbûn: Di zagonên esasî ya Tirkiyê de hemwelatîbûn, ji pirçandîbûna civatê dûr, bi awayekî neteweperestî hatiye nivîsandin. Binavkirina hemwelatîbûn ku bi nasnama "tirkbûnê" ve hatiye girêdan, gelek aliyên civatê derveyî xwe de hiştiye û bi taybetmendiyên xwe yê ji "berhevkirinê" wê de bi aliyê xwe yê "belavkirinê" derketiye pêş. Nirxandina hemwelatîbûna bi vî rengî, astenga herî mezin ya li ber aramîbûna civatê ye. Ji ber vê yekê ye ku her makezagonekî ku amanca wî berhevkirina civatê û hevjiyana aştiyane ye, -berî her tiştî- divê binavkirina hemwelatîbûna çewt de guherînê biparêze û guherînên pêwîst pêkbîne.

Di hemwelatîbûna makezagonî de, du taybetmendiyên guherînên hemwelatîbûnê hene: Ya yekemîn ew e ku divê pêşî li polîtîkayên eşkere an jî dizî ya bişaftin û cudaxwaziyê ku ji alî saziyên dewletî ve tê birêvebirin red bike. Di vî warî de çi kes nikare hemwelatîbûnê, wekî enstrumanekî homojenîzekirinê binirxîne. Ziddê vê yekê hemwelatîbûn, divê wekî sengera parastinê ya pirrengiyên civatê be. Bi vê nêrînê ve hemwelatîbûn, ji siyaseta demokratîk re jî bingeh çêdike. Eşkereye ku heke mafên sîvîl û siyasî yên kesan ji alî makezagonê ve bê parastin, ango mafên nasnameyî neye redkirin, pirsgirekên navbera hemwelatiyan jî –bêyî ku dijberiya hev bikin- bi awayekî demokratîk tê gengeşîkirin; ango bi her awayî rê li ber gengeşiya demokratîk tê vekirin.

Duyemîn taybetmendiya hemwelatiya makezagonî, binavkirinê de ye; divê hemwelatîbûn ji hemû nasnameyên etnîkî, olî û çandî bête bêparkirin. Di hemwelatiya makezagonî de, çênabe ku hemwelatîbûn bi nasnameyekî etnîkî, olî û çandî ve bête binavkirin. Her weha çênabe ku cûdaçandekî din ku ew jî beşekî ji çanda civatê ne, li hember yekê dî/hinekên din, bi awayekî cîhawazî bê parastin. Di vî warî de makezagon, nirxên piraniyê dihewîne û di navbera komên ku civatê pêkanî de jî pîvanekî wekhev diparêze. Bi vî awayî her rengên civatê ji alî makezagonê ve tê parastin û pêşî li ber van rengên cûda yên civatê tê vekirin; rengên cihê yên civatê dikarin xwe pêşve bibin.[3]

Di "Hemwelatiyên Makezagonî" de, pêwîst nîne ku hemwelatî kî ye, çi ye, di makezagonê de bête binavkirin. Ji dêvla wî mirov dikare di makezagonê de hemwelatiyan bi rengekî din binavbike; ango tê gotin ku hemwelatîbûn mafekî makezagonî ye, hemwelatîbûn û ji hemwelatiyê dûrxistin bi zagonan tê sererastkirin, çênabe ku tu kes bi awayekî kêfkarî ji hemwelatiyê bête dûrxistin, bête derwelatkirin û hatina wî/wê ya welat bête astengkirin. Bi vî nêrînê ve mirov dikare di makezagonê de xala hemwelatiyê bi vî awayî sererast bike: "Hemwelatîbûn mafekî bingehîn e. Di xwedîmafbûna hemwelatîbûn de, di karanîn û windakirina wî de, çi cûdabûnek olî, zimanî, nijadî, etnîkî û yên wekî wan li ber çav nayê girtin. Esasên xwedîmafbûna hemwelatîbûn, bi zagonê tê sererastkirin."[4]

Pirçandeyî û Nirxên Çandî: Pirçandeyiya civatê, divê di serî de destpêka makezagonê de bête binavkirin. Makezagonên hevdem, bi xalên bi vî rengî hatine nivîsandin. Mirov dikare gelaleyê Makezagona Yekitiya Ewropayê ku tê de "Yekîtî, ji çand, ziman û olên cûda re rêz digre," hatiye nivîsandin û di xala 27'emînê Makezagona Kanadayê ku bi navê Belgenameyê Maf û Azadiyê hatiye binavkirin de jî, hukmê ku "Ev belgename ji alî parastin û pêşvebirina mîrata pirçandiya Kanadayê cûda naye şirovekirin," cîh digre, mînak bide. Lê naskirina pirçandeyiyê ya li makezagonê tena serê xwe tiştekî çareser nake. Li ber vî mafî, divê mafên çandî jî di bin parastinê de be.[5]

[2] Andrew Heywood, Siyaset, Weşanên Liberte, 2006, r. 427-428.
[3] Coşkun, Hemwelatiya Makezagonî, r. 146.
[4] Coşkun, Hemwelatiya Makezagonî, r. 151.
[5] Mustafa Erdoxan, Çarçoveyekî Ji Bo Çareseriya Demokratîk, Rojnama Star, 29.08.2009

Ji alî mafên çandî, perwerdeya bi makeziman di serî de ye. Di makezagonekî demokratîk de parastina perwerdeya makezimanê ya ji bo herkesî, bêyî ku cîh bide şikekî, divê bi awayekî vekirî û zelal bête nivîsandin. Ev maf divê tevayî pêvajoya perwerdeyiyê, vegire bandora xwe.

Beşdariya Siyasî; tenê bi pêkanîna mekanîzmayên demokratîk ku ji herkesî re vekirî ye û ji holê rakirina dezgeyên ku li ber biryargirtinê asteng in, tê bikaranîn. Makezagonê ku niha tê bikaranîn, her çiqas rêgeza "di niwêneriyê de edlahî" biparêze jî, ji ber %10'a kotaya hilbijartinê, di tevahiya welatê de, bi taybetî jî li cîhên ku kurd lê piranî ne, ji alî niwêneriyê ve bêedlahiyekî derdixe pêşberî gel. Partiyekî ku bi mîlyonan deng bigre û ji ber vê kotayê nikaribe li parlamentoyê cîh bigre, tesîra xwe li hilbijêran jî dike ku ev hilbijêr xwe dikarin mexdûr an jî li der sîstemê bihesibînin. Ew hilbijerên ku dixwazin bi riya partiyê ku deng dane raya xwe bighînin parlamentoyê, an jî dixwazin xwe bi wan kesên ku ew hilbijartine bidin "temsîlkirin", ji ber vê astengê bi rastiyekî din ve jî rûberû dibin, her weha bawerî bi çareserkirinên riya siyasî naynin û xwe ji riya siyasetê dûrdixin. Ev rewşa han dibe sedem, ku di demekî dirêj de demokratîzebûna civakê jî dikeve astengiyê.[6] Ji ber vê yekê ye ku rakirina kotayê hilbijartinê ji bo beşdariya siyasi ya demokratîk, riya herî rast e.

Bihêzkirina Rêvebiriya Herêmî: Tirkiyê, herî welata navendî ya cîhanê ye. Ev rêvebirina navendî ya tûnd, pêywendiyên li navbera rêvebiriyên herêmî û navendî, ji alî rêvebiriyên herêmî ve asteng dike û biryardariya herêmî ji holê radike, wî bi navendê ve girê dide. Ev pêywendî jî dibe sedem ku hem gelên li herêman dijîn nikarin ji heyiyên dewletê sûd bigrin, hem jî ji ber astengan, gelên herêman nikarin daxwazên xwe bighînin rêvebirên navendê. Encama vê rewşê de gel, bawerî pê tînin ku hesta wan ê demokrasiyê bi tiştekî naye hesibandin û ji berê kêmtir bawerî bi hukumet û dewletê tînin; baweriya gel li hember rêvebirên navendî qels dibe. Ji ber ku ev astengî ji holê rabe pêwîstiya Tirkiyê zêdetir bi rêvebiriya xwenavend û demokratîk re heye. Ev pêwîstî, bi hêzkirina rêvebiriya herêmî ya ji alî emnahî, tenduristî û perwerdeyî ve û her weha bi zêdetir parvekirina heyiyên aboriyê ve zêdetir berbipêş ve dere. Di rastiya xwe de di pêşniyara makezagona rêvebiriya Yekîtiya Baroyên Tirkiyê ku ji raya gel re jî hatibû pêşkeşkirin de jî bi awayekî xurt dihat gotin ku divê Tirkiyê ji alî rêvebirinê ve herêmî be.[7] Rêvebiriyên herêmî ku ji alî huqûqî û aborî ve xurt in, ji alî pirsgirekên gel jî çareseriyên demokratîk derdixe pêşber û demokrasiyê jî ji berê qewîtir dike. Ev ray û ramana ji alî gelek kes û saziyan jî bi awayekî baldar tê parastin.

Di makezagonekî nû de, bi tevî hawîrdor, aborî, mafên civakî û hwd., dive ji alî naskirina cûdahiyan jî gav bên avêtin û van cûdahiyana bêne parastin û bi gor esasên hemwelatiya makezagonî guherînên pêwîst bêne çêkirin, ji alî çareserkirina pirsa kurdî ya Tirkiyê jî wê rewş berbipêş ve biguhere.

DI PIRSA KURDÎ DE RASTÎ Û EDLAYÎ

Sazî û ristên ku piştî kudetaya leşkerî ya 12 Îlonê 1980'an û şerê çekdariyê ku di sala 1984'an de destpêkir derketin holê, di pirsa kurdî de ji **bêedlahiyên heyî wê de**, bêedlahiyên din yên bêhempa jî derxist holê. Ji bo ku van bêedlahî ji holê rabin, tiştên ku werin pêkanîn mirov dikare bi kurtî wiha binav bike:

1. Ji bo ku parastina mal û milk û jiyana nişteciyên ku li wargehên dûr dijîn û hêzên ewlekariyê jî nikarin xwe bighînin wan dera, di 26.03.1985'an de bi riya zagona bi jimara 3175'an, di Zagona Gunda jimara 442, xala 74'emîn de guherînek hat çêkirin û Cerdewaniya Gunda ya Muwaqetî hat damezrandin.

Bi zagona 3715'an xala 1'emîn ku di 26.03.1985'an de hatiye qebûlkirin, guherînek di xala 74'emîn ya Zagona Gunda de çêbû. Bi vê gûherînê ve hukmekî li zagona navkirî zêde kirin. Bi vê zêdekirinê ve di bajarên ku alî Heyeta Wezîran ve hatine tesbîtkirin de; an jî sedemên ku rewşa awarte bên îlankirin de, çalakiyên çekdarî û dijwarî yên ku jiyana gundiyan dixin xeterê

[6] Ji bo pirsgirekên ku kotaya % 10 derxistiye holê, binêrin, Vahap Coşkun; Kotaya Li ber Xwestekên Demokratîk: % 10, Mavî Terazî, Jimar 3, Çileya Paşîn-Sibat 2007.

[7] Pêşniyara Makezagonê ya Yekîtiya Baroyên Tirkiyê, Çapa II, 2001, Weşanên YBT, No:14. r. 79-80.

û dorhêlên wan bêemnahî dikin de, her weha bi çi sedemê dibin bila bibe, heke jiyan, mal û milkê gundiyan di xeter de be, bi daxwaza walî û erêkirina Wezîrê Navxweyî ve heta ku pêwîst be dikarin cerdevanên muwaqet îhdas bikin.

Bi vê guherînê ve Cerdewaniya Gunda ya Muwaqetî, bi biryara 9632 ya Heyeta Wezîran ji 27'ê Hezîrana 1985'an heta niha, li Herêma Rojhilat û Rojhilatê Başûr de tête bikaranîn. Hê jî li 22 bajarên ku Cerdewaniya Gunda ya Muwaqet tê bikaranîn de, li Diyarbekirê 5274, li Şirnaqê 6835, Li Batmanê 2943, li Bîngolê 2.533, li Bêdlîsê 3796, li Mêrdînê 3,360, li Muşê 1918, li Sêrtê 4680, li Wanê 7.365, li Hekkariyê 7643, li Tunceliyê 386 li Adiyamanê 1510, Li Agiriyê 1881, Li Ardahanê 96, li Elazîzê 2115, li Gazîantebê 565 li îdirê 374, li Maraşê 2267, li Qersê 578, li Kîlîsê 34 li Meletyeyê 1392, li Urfayê 966, bi tevahî jî 58511 cerdewanê muwaqet hene.[8] Ev jimara cerdewanan di tarîxa 20.03.2009'an de gêhişütiye 71.907.[9]

Jimara cerdewanên ku ji ber tawanên wan ji kar hatine dûrkirin jî bi hezaran tê îfadekirin.[10] Bûyera herî dawî ku li gundê **Zanqirtê (Bîlge)** çêbû ku wekî tevkuştinekî hate binavkirin û li ser civatekî mezin tesîra xwe kir, bi destê cerdewanan û dîsa bi çekên ku ji bo cerdewaniyê hatibûn dayîn pêkpat. Di dewletên huqûqî de karên ewlekariyê yên bi vî rengî, bêgûman bi destê karmendên dewletê ve tê meşandin. Ji ber vê yekê divê berî her tiştî sîstema cerdewaniyê ku ji ber şerê çekdarî hate damezrandin, bi riya zagonekî nûjen ji holê bê rakirin.

2. Di vî warî de yek ji pêkanînên herî dijwar jî, herêmên ku hatine valakirin an jî vala bûne ye. Ev êrîşekî mezin li hember mafê mulkiyetê ye. Bi gor Komîsyona Lêpirsînê ya ku di sala 1997'an de li Parlamentoya Tirkiyê de hatibû damezrandin, jimara wargehên ku hatine valakirin an jî xerakirin (gund, mezra, kom) nêzî 3428 in. Her weha di vê raporê de tê gotin ku li cîhên ku hatine valakirin herî kêm 2 mîlyon kes bi awayekî zorî ji axên xwe hatine dûrkirin, koçî wargehên din kirine.[11]

Tirkiye, bi gor bernameya KOB'ê ku ji alî Konseya Yekîtiya Ewropayê ve hatiye amadekirin, "Bernameya Netewî" amade kiriye û berê xwe daye ber bi YE'yê. Bi vê yekê ve girêdayî 19 Adar 2001'an de bi biryara Heyeta Wezîran ya bi jimara 2001/2129, bernama bi navê "Bernama Netewî ya Parvekirina Muktesebata Yekîtiya Ewropayê" hatiye amadekirin û ev bername 24 Adar 2001'an de li Rojnama Fermî ya dewletê hatiye îlankirin û ketiye rojevê.

Tirkiye, di Bernama Netewî beşa pêşaneyên demdirêj de, biryar daye ku wê hin guherînên zagonî bike ku ji bo zirarên dema tekoşîna dijberê terorê ji holê rake û her weha bi vê biryarê ve jî îlankiriye ku wê guherînên pêwîst hetanî sala 2004'an wê çêbike.

Bi van esasên heyî li Tirkiyê bi jimara 5233, zagona Telafîkirina Zerar û Ziyanên Tekoşîna Li Hember Terorê, di 11.07.2004'an de hatiye qebûlkirin û ev zagon 27.07.2004'an de li rojnama fermî ya Tirkiyê hatiye belavkirin û ketiye rojevê[12]. Pêkanîna xala muwaqet yê 1'emîn ya zagonê, di roja 25.07.2005'an de qediya. Piştî vê yekê 28.12.2005'an de bi zagona jimara 5442 dema serîlêdanê heta 28.12.2005'an hate dirêjkirin.[13]

[8] Ji bo agahiyên dehî zêde binêrin Sezgîn Tanrikulu – Serdar Yavuz, Ji Alî Mafên Mirovan Ve Bîlançoya Rewşa Awarte, Kovara Lêkolînên Zanyariya Civakî, Îlon 2005, Jimar 6, Rûpel 493–521.

[9] Bersîva Wezareta Nawxweyî 20.03.2009 tarîx û bi jimara 532.02-294 ya Pêşniyarnameyê Nivîskî re.

[10] Bi gor rapora Komela Mafê Mirovan ya bi tarîxa 08.05.2009, ango "Rapora Taybetî Ya Di Navbera Çileya Paşîn 1999-Adar 2009'an De Tawanên Cerdewanên Gund Ya Li Hember Mafê Mirovan", ji alî cerdevanan ve di navbera Çileya Paşîn 1999-Adar 2009'an de 38 şewitandina gund, 14 valakirina gund, 12 tacîz û tecawiz, 22 rewandin, 294 êrîşa çekdarî, 183 kuştin, 259 birîndarkirin, 2 wendakirin, 50 înfaz, 70 xesp, 562 îşkence û xerabkarî, 59 binçavkirin, 9 sedebûna xwekuştinê, 17 şewitandina daristanê; serhev jî 1613 kiryarên dijî mirovayetî hatine pêkanîn.

[11] Meclîsa Netewî a Gel a Tirkiye, Rapora bi navê "Gundên ku li Rojhilata Başûr Hatine valakirin û Komîsyona Lêpirsînê ya Pirsgirêka Koçberiyê" ku 15.01.1998'an de pêşniyarê Serokê Meclîsê kiriye.

[12] Rojnama Fermî; Tarîx: 27.07.2004, Jimar 25535.

[13] Rojnama Fermî; Tarîx: 03.01.2006, Jimar 26042.

Piştî ku vê dema jî xilas bû bi zagona 5666[14] dema serîlêdanê ji roja 30.05.2007'an pê ve salekî din jî hatiye dirêjkirin.[15] Bi gor zagonê, encamlêanîna serîlêdanan bi biryara Heyeta Wezîran ya bi jimara 2009/15347, bi gorî biryara Heyeta Wezîran yê berê, ango 14.07.2008 tarîx û jimara 2008/13935, ji dema dirêjkirî wê de salekî din jî hatiye dirêjkirin.[16]

Piştî ku zagonên heyî hatine qebûlkirin pênc sal derbas bûye, lê çi serîlêdanekî bi awayekî nîhayî biencam nebûye. Ev yeka bi xwe jî nîşan dide ku zagon, telafîkirina zirar û ziyanan de qelsiyekî derdixe holê. Ji ber vê yekê ji bo ku mexduriyet ji holê rabe, ango ji bo zirar û ziyanên mal û milk û aboriyê bi tevî zirarên manewî bête telafîkirin, divê xebatekî nû bê çêkirin.

3. Ev bîstûpênc salên dûmahî ya li Tirkiyê; gelek bûyerên ku wekî tawanên li hember mirovatiyê jî bê qebûlkirin bi hezaran ziyandanê maf pêkhatin. Yê ku di vî warî de hatin jiyîn yek ji wan jî, kuştinên qesasnediyar û windakirin in. Sê erkên dewletê di vî warî de tewrên ji hev cûda nîşandan. Saziyên zagonsazî, di tarîxên cûda de hin komîsyonên lêkolînî damezrand. Ev komîsyonên han di raporên xwe de cîh dan nêrînên balkêş û ji bo çareseriyê jî tedbîrên giranbiha pêşniyar kir. Lê hukumetên heyî ji dêvla ku tedbîran bigrin, bi piranî sazî û kesên tawanbar parastin. Bi vî awayî jî berpirsiyariya van bûyerên qirêj parvekirin. Saziyên Darazî jî, di van deman de ji dêvla ku otopsî bikin û bûyerê derxin holê, piranî lêkolînan dan sekinandin û gelek car jî biryar girtin ku ji ser bûyerê dem boriye û dev ji lêkolîna bûyeran berdan.[17] Hê jî di kartonên lêgerînên daîmî ya Dadgeriyên Komarî de, hezaran dosyayên qesasnediyar hene ku li benda lêkolînê ne.

Ji alî kuştin û windakirinên qesasnediyar de zehmetiyekî din jî xwegîhandina delîl in. Piranî tawanbar li bendê ne ku demderbasbûna bi gor zagonê temam bibe. Ji xwe piranî jî weha dibe û tawanbar dû re eşkere dibin.[18]

Her weha bi gor xala 76'emîn ya ZKT (Zagona Komarên Tirkiyê) de jî hatiye gotin tawanên jenosîdî û hin tawanên ku li derveyî welat hatine pêkanîn, ji bo tawanên li welat hatine pêkanîn naye bikaranîn ku ew jî babetekî rexneyî ye.[19]

Di vî babetî de pirsa herî girîng, nedîtîn an jî negirtina qesasan e. Ev pirsgirêka ku bi demderbasbûna dozê ve elaqadar e, bi serrastkirin û lêzêdekirina xalekî îstîsnayî ya zagonên demderbasbûnê ku xala 66'emîn de nivîsandiye, ango zagona bi jimara 5237'e ZKT'ê, tê çareserkirin. Zîra dosyayên kuştin û windakirinên qesasnediyar ku berê 01.06.2005'an hatine pêkanîn, bi gor Zagonên Komara Tirkiyê jimara 765, xala 102/2'yê 15 sal, piştî ku ZKT jimara 5237 hate qebûlkirin jî bi gor xala 66/1-b'yê jî kuştin û windakirinên qesasnediyar di 25 salan de dikevin ber bi demderbasbûnê.

4. Tê zanîn ku Komisyonên Rastiyê, dezgeyên lêkolînî ya tawanên dijî mirovayetiyê ne ku bi taybetî li welatên dema borî de tawanên bi riya artêş, saziyên dewletî an jî rêxistinên çekdar yên dijberî rejîmê ne, lêdikole. Bi gotinekî din, "*komîsyonên rastiyê, ji bo lêkolînên li civatên ku dema borî de bi awayekî giran dijwariya siyasî re an jî şerekî navxweyî re rûberû bûne, têne damezrandin ku ew civatên han bikaribin bi paşerojê xwe ve rûberû bibin û hisaba paşerojê bipirsin.*" Komîsyonên rastiyê piranî ya di dema derbasbûyînê de yan jî piştî dema derbasbûyînê tên damezrandin. Yên Komîsyonên rastiyê yên netewî dadimezrînin, piranî

[14] Rojnama Fermî; Tarîx: 30.05.2007, Jimar 26537.

[15] Ji bo agahiyên dehî zêde binêrin Esasên Dawîlêanîna Huqûqê Navxweyî û zagona ku bi gor xala 13'emîn ya Peymana Mafê Mirovan ya Ewropayê (PMME) ku di çarçova "Riya Serîlêdanê ya Bi Tesîr" hatiye amadekirin, ango zagona ku li Tirkiyê bi jimara 5233, bi navê Rewşa Huqûqî ya Komîsyonên Zirar û Ziyanê derketiye, Kovara Huqûq û Huqûqa Rexneyî, Sal 4, Jimar 19, Bihar 2007, r. 233-261.

[16] Rojnama Fermî; Tarîx: 03.09.2009, Jimar 27338.

[17] Av. M. Sezgîn Tanrikulu, Di Belgeyên Dewletê De JÎTEM-Ergenekon (Zagonsazî-Rêvebirin-Darazî), Guncel Huqûq, Adar-2009, Jimar: 3/63.

[18] Di vî warî de hatina Mehmet Şenerê ya ku yek ji tawanbarên kûştina Abdî Îpekçî bû, mirov dikare wekî mînakekî rêbide. "Pirsên li Tarîtiyê Mane", Belma Akçûra, Mîlliyet, 19.08.2009.

[19] Artuk-Gokcen-Yenidunya, Şerha Zagonên Komara Tirkiyê (ZKT), Derpêç 2, Rûpel 1722, Weşanxana Turhan, Ankara, 2009.

saziyên zagonsazî ya dewletê ne; lê kêm caran jî saziyên darazî van komîsyonan dadimezrînin û diparêzin.[20]

Ku em bi vî çarçoveyê çav li pirsan bikin, encamên ev ziyandan û travmayê ku dişibihe şerekî navxweyî û her weha tawanên şerê ku hatiye jiyîn, incax ji pirsên heyî azad, bi awayekî serbixwe û bêgirêdan, bi riya komîsyonên rastiyê têne lêkolîn. Berî ku serrastkirinekî zagonî bê çêkirin, bi riya komîsyonên lêkolînî ya meclîsê ku bi gor xala 98/2'emînê Makezagonê têne damezrandin jî hin gav têne avêtin; Van komîsyonên han bi beşdariya kesên ji nav parlamentoyê û pisporên derveyî parlamentoyê, dikarin lêkolînan bikin û ji bo rastiyê derxin holê bihev re hin gav bavêjin. Ev komîsyonên han dikarin rastiya lêbikolin, derxin holê, ji bo pêkanîna edaletê dikarin pêşniyaran bikin. Meclîsa Mezinê Komara Tirkiyê, dikare di vî warî de gavekî bavêje.

5. Zîndana Diyarbekirê, piştî sala 1980'an bi zilm û zordariyê ve hate naskirin. Zilma ku li vê zîndanê hatiye jiyîn herçiqas di navbera salên 1980-1984'an bi îşkencedîtina hezaran girtî û bi kuştina dehan kesê hatibe naskirin jî, tê zanîn ku ev zîndana her dem ji alî bişaftina mafê mirovan ve derketiye pêş. Bi vî awayî di nav zîndanên herî xerab ya cîhanê ve hatiye jimartin. Bûyera ku 24'ê Îlonê 1996'an de hatiye jiyîn ku di vê bûyerê de 10 girtî hatibû kuştin û 24 girtî jî bi awayekî giran hatibû birîndarkirin, hê jî di dadgehê de negihîştiye encamekî. Ji alî gelek derdoran ve tê gotin ku tiştên li vê zîndanê hatine jiyîn, her weha sedemekî şerê hê jî domdike ye.

Di dema vebûna demokratîk de, wekî gavekî telafîkirinê bêgûman berî her tiştî, divê rewşa zîndana Diyarbekirê bigûhere. Lê ev gavê han ne ji ber taybetmendiya bajarvaniyê, divê ji ber navê xerab ya vê zîndanê bê avêtin. Divê bangên ku di vî warî de hene jî bigrin ber çav û ev zîndanê han vegûhezînin muzeyekî mafê mirovan ku tê de gelek çalakiyên din jî bêne pêkanîn.[21]

6. Tiştên ku bi tevî vebûna demokratîk ve were pêkanîn, ango ji bo aştî û lihevkirinê, ji bo tawanên siyasî, divê darizandinên heyî û hukmên hatine birîn jî tê de, hin serrastkirinên zagonî were çêkirin. Ew serrastkirinên ku berî niha hatine çêkirin ku piranî bi navê "poşmanî" tê zanîn, hate dîtin ku kêrî tiştekî naye û tu kes vê yasayê napejirîne. Serrastkirinên zagona 5237, xala 221'ê ya ZKT ku bi navê "poşmaniya çalak" tê zanîn jî, ji bo çareseriyekî mayînde, têr nake. Ji ber ku peyva "Efû" jî pêşî li vê pêvajoyê venake, divê gavên din bên avêtin. Ji bo ku encamên hemû tawanên siyasî ji holê bê rakirin, dikarin piştî çend salên ku em tê de ne bi navê "Zagona Tevlîbûna Jiyana Civakî û Siyasî ya Wekhev û Azad" zagonekî amadebikin.[22]

7. Zarokên ku bi tawana beşdarî civîn û çalakiyan bûne, hatine girtin û sizakirin, ji alî dagehkirina zarokan ve li civatê bûye sedemên birînên xedar. Ev kiryarên han ji alî raya giştî ve jî, ji alî edaletê ve tê lêpirsîn. Divê berî her tiştî, zarok bêyî ku bi sîstema darizandinê ve rûberû bibin, çareserî ji vê yekê re bê dîtin. Tê dîtin ku zarok bi awayekî bi darizandinê ve rûberû bibin, êdî riya paşvegerînê namîne û zarok ji vê kiryarên han mexdûr dibin. Di vî warî de tiştê pêwîst ew e ku bi tevî serrastkirinên din ve serrastkirinê ku ji serokatiya Meclîsê re hatiye dayîn, ango guherîna di derhaq xala 9 û 13'emînê Zagona Tekoşîna li Hember Terorê, demekî zû were derxistin.[23]

DI PIRSA KURDÎ DE PÊŞANIYÊN ZAGONÎ

Ji bilî mekanîzma û serrastkirinên ku mexdûriyetên heyî ji holê bê rakirin têne pêkanîn, ji bo çareserkirina pirsê jî divê hin serrastkirinên zagonî bi awayekî lez bêne pêkanîn.

[20] Ji bo agahiyên berfireh binêrin Prof. Dr. Mîthat Sancar, Bi Paşerojê Re Rûberûbûn, Weşanên Îletîşîm, Çapa 1, 2007.

[21] Ji Diyarbekir re Muzeya Mafê Mirovan, Komîsyona Lêgerînên Rastî û Edaletê ya Zîndana Diyarbekirê, Radîkal Îkî, 13.09.2009, Jimar 674.

[22] Av. M. Sezgîn Tanrikulu, "Tirkiye li Modêla xwe Digere " rêznivîs, Mîlliyet, 06.08.2009.

[23] Pêşniyarnameyê ku di 12.02.2009'an de hate pêşkeşkirin ku di Zagona Tekoşîna li Dijê Terorê de daxwaza guhertinê dike.

8. Azadiya Ramanî; Serrastkirinên nehînî ya zagona li derhaq azadiya ramanî ku bi jimara 5237 ya ZKT ku 1'ê Hezîranê 2005'an de hatibû qebûlkirin, bi biryarên saziyên darazî carekî din jî bi eşkereyî derket holê. Berî ku ZKT bête qebûlkirin Baroya Diyarbekirê nêrîn, pêşniyar û rexneyên xwe anî ziman û bi tevî hin xalên din wekî 215, 216, 220/8, 288, 301 û 305 ve serrastkirin daxwaz kir.

Baro, di nêrînên xwe de wiha digot: "Pêşnûmayê ku serrastkirinên nediyar û razber dipejirîne, ji alî azadiya ramanî ve tu tiştên nû nayne, her weha carekî din bandor li azadiya ray û ramanê datîne, dijberên civakî ya siyasî û civakî carekî din dixe nav qalibekî, dixwaze rêgeza pirhejmariyê ya demokrasiyê ji holê rake û sîstemekî bi bandor damezrîne. Tê dîtin ku pêşnûme bi vî awayê xwe ve dîsa hukmê zorê dipejirîne û navkirina tawanê bi awayekî eşkere binav nake. Ev jî wê di biryaran de rê li nirxandinên subjektîf re veke. Bi vî awayî ji alî azadiya ray û ramanî pirsgirêk neyê çareserkirin."[24]

Her çiqas piştî darizandin û mehkumkirinên ray û ramanî li ZKT jimara 301'an de hin guherînên din hatibin kirin jî[25], tê zanîn ku di pirsa kurdî de pirsgirêk, ne ZKT xala 301'an e. Ji bilî vê zagonê xalên ku li jor me binavkir û ZKT jimara 3713 ya Zagona Tekoşîna Dijî Terorê, xala 7/2, bandorekî mezin li azadiya ray û ramanî datîne.

Azadiya ray û ramanî, divê ji alî guherînên zagonî ve serrastkirinên pêşanî ya vebûna demokratîk be. Zîra hê jî bi sedan biryara mehkumbûnê ku înfaza wê didome, an jî biryarên ku li bendê yeqînkirinê ne û darizandinên ku didomin hene. Di çareserkirina pirsê de xala herî girîng bêastengkirina azadiya ray û ramanî ye. Ji ber vê yekê ye ku divê di pêvajoya vebûna demokratîk de tiştên hatine pêkanîn derkevin holê û reformên azadiya ray û ramanî bête kirin.

9. Navên Kurdî: Di Zagona Gelhejmariyî ya tarîx 05.05.1972 û jimar 1587'an, xala 16'emîn de dihat gotin ku, "Navên ku dijberî çanda me ya netewî û kevneşopê me re biyanî be û raya giştî eciz bike, ji zarokan re nikare bê danîn, zarokên welidîne paşnavê bavê xwe, zarokên ku bêbav çêbûne jî paşnavê diya xwe digrin." Duyemîn hevoka vê zagonê bi zagona ku 19.07.2003 tarîx û jimara 25173'ê de di rojnama fermî de hate belavkirin, ango bi zagona jimara 4928'ê ku di hin zagonan de guherîn pêk anî, hate gûhertin. Di 5'emîn xala vê zagonê ve hevok bi vî awayî ji nûve hate nivîsandin: "Navên ku ji rêgezên ehlaqî re dijber e û raya giştî diêşîne, nikare bê danîn, zarokên welidî ne paşnavê bavê xwe, yê bêbav jî paşnavê diya xwe digrin."

Zagona Gelhejmarî ya bi jimara 1587, dû re bi Zagona Karûbarên Gelhejmariyê ya bi jimara 5490, xala 71'emîn bi tevayî hate rakirin û ev zagon jî di rojnama fermî ya bi tarîxa 29.04.2006 û jimara 26153'an de hate belavkirin. Di zagona jimara 5490'an de ew benda ku me li jor behs kir, cîh nagre. Bi vî awayî jî bi gor zagonên heyî di hilbijartina navan de çi astengî û qedexebûn tune ye.

Lê niha jî em dizanin ku bi navê hezaran kesan hê jî nehatine tescîlkirin û van kesana nikarin navên xwe yê rojane di karên fermî de bikarbînin. Navê kesan di der û dor û fermiyetê de ne wekî hev in. Bêgûman, mirov dikare bi riya dadgehan doz veke û navê xwe bigûherîne. Lê divê di pêvajoya vebûna demokratîk de bêyî ku hemwelatî bi riya dozê ve mijûl bibin, ji guherînên navan re çareseriyekî din bête dîtin. Bi serrastkirinekî zagonî dikarin xalekî muwaqetî li Zagona Gelhejmariyê zêdebikin û kî ku di navbera salekî de serî li saziyê gelhejmarî bidin, dikarin navên xwe biguherînin û yê rojane bixebitînin.

10. Zagona Paşnavê: Pêkanîna zagona paşnavê jî bi pirsgirêk e.[26] Tê zanîn ku yên dû re bibin hemwelatî dikarin ji xwe re paşnavekî nû bigrin, ji bilî vana yên dixwazin paşnavê xwe biguherînin tenê bi riya dadgehan vê yekê dikarin pêkbînin û ev rê jî bi pirsgirêk e. Bi gor mewzûatên heyî, kesekî bixwaze paşnavê xwe bi gor peyvekî bingeh tirkî biguherîne, ji alî

[24] Agahiya çapemeniya Serokatiya Baroya Diyarbakerê ya bi tarîxa 20.11.2006 û jimara 2006/1226.
[25] Rojnama Fermî; Tarîx: 08.08.2008, Jimar 26870.
[26] Rojnama Fermî; Tarîx: 02.07.1934, Jimar 2741.

zagonê ve tu pirsgirêkekî dernakeve. Lê kesên ku bixwazin paşnavê xwe bi peyvekî ne tirkî biguherînin, ango paşnavê nû tu dijberiya wî ji sazbûna raya gişтî re tune be jî, dadgeh piranî paşnav naguherîne û yên bi guherîna paşnavê serî li dadgehê dane, bi astengan re rûberû dibin. Bi vî awayî jî di navbera kesên ku rewşa wan ê huqûqî wekî hev in de, newekheviyekî derdikeve pêşberî me. Di vî warî de hemwelatiyekî suryanî ku ji bo paşnavê xwe biguherîne serî li Dadgeha Huqûqî ya Asliyeyê ya Mîdyadê daye û serîlêdana vê kesê han bi awayekî rasteqîn hatiye nirxandin, niha Dadgeha Makezagonî de ye û Dadgeha Makezagonî biryar daye ku daxwaza dadgeha herêmî ji bingehê ve lêbikolîne.[27]

Ji ber vê yekê divê li benda dadgehê neyê sekinandin û di Zagona Paşnavê bi jimara 2525'an de serrestkirinekî bêyî ku "navên nijad û gelên biyanî" cîh bigre, guherînek nû bê çêkirin.

11. Navên Gunda: Zagona ku gundên navê wan ne tirkî ye sererast dike, ku rojnama fermî de di 18.06.1949 tarîx û jimara 7236'a de hatiye belavkirin, ango di xala d'yê benda 2'emîna Zagona Rêvebiriya Bajaran de bi zagona 11.05.1959 tarîx û jimara 7267'an ve guherînek hate çêkirin û xala 1'emîn bi vî awayî hate serrastkirin: "Lê; navên gundê ku ne tirkî ne û dibin sedemê îltîbasê, piştî ku raya Encumena Gişтî ya Bajarî bê stendin, divê di demekî herî kurt de ji alî Wezaretê Navxweyî ve bêne guhertin." Bi riya vê hukmê di 50 salên dumahiyê de navê hezaran wargehan hatine guhertin. Tê zanîn ku nav, temsîla hebûna çandan dike û çandên heyî ji yên din vediqetîne. Di dewletekî demokratîk de jî yên rêvebir divê ji van cûdayiyan re hurmet bigre û wan biparêze.

Meclîsa Gişтî ya Bajarî ya Diyarbekir, bi navê hurmet girtina vê cûdayiyê biryarekî girt û xwest ku navên wargehên Diyarbekirê bi navên kevin ku hatine guhertin re bikarbîne. Lê biryara Meclîsa Gişтî ya Bajarî ya Diyarbekir, li ser dijberiya Walîtiya Diyarbekirê di dadgeha îdarî de hate darizandin. Piştî pêvajoya darizandinê dadgeha bilind ya bi navê Daniştay biryarek girt û biryara dadgeha herêmî pejirand. Di vê biryarê de tê gotin ku, Meclîsa Gişтî ya Bajarî ya Diyarbekir nikare biryarekî wiha bigre. Ango dadgeha bilind kiryarên Walitiya Diyarbekirê rast dît.[28]

Ji alî vê pirsgirêkê jî divê xala 2'emînê zagona 5442'an bête guherandin. Bi serrastkirinekî ve biryar tê girtin ku piştî zagona bi jimara 7267'an hate pejirandin û di tarîxa 11.05.1959'an de jî kete rojevê, çi navên wargehên ku hatine guherandin, bêyî ku biryar ji ciyekî din derkeve dikarin bêne bikaranîn.

12. Pirsgirêka Tîpan: Zagona bi jimara 1353'an ya "Zagona Pejirandin û Bikaranîna Tîpên Tirkî", xala 2'emîn di şîrket, komel û saziyên taybetî de pejirandin û karanîna tîpên tirkî sererast dike, xala 4'emîn jî çapkirina rojname, kovar û pirtûkan bi tîpên tirkî mecbûr dike, hê jî di rojevê de ne û têne bikaranîn.[29]

Her weha çiqas di zagona bingehîn bi xwe de kiryarekî nû nehatibe pejirandin jî, bi gorî Zagona Komara Tirkiyê ya bi jimara 5237 û xala 222'emîn, yên ku dijberiya vê zagonê dikin têne sizakirin. Tê zanîn ku bi gorî vê zagonê gelek doz hatine vekirin û hin ji van dozan hê jî didomin.[30]

---

[27] Biryara bi Riya Def'î ya dijrabûna Dadgeha Huqûqî ya Asliyeyê ya Mîdyadê ku bi jimara bingehî 2009/71 û bi tarîxa 10.06.2009'an de çûbû Dadgeha Makezagonî, ji alî vê dadgehê ve jî bi dosyaya bingehî ya 2009/47 ve ji bingehê hatiye pejirandin.

[28] Belavkirina Daîra 8'emîn ya Daniştayê, bi tarîxa 10.06.2009, Bingeh 2007/8635 û Biryar 2009/4200.

[29] Zagona ku di 03.11.1928'an de li rojnama fermî ya di jimara 1030'an de hatiye belavkirin, ango "Zagona Di derhaq Pejirandin û Bikaranîna Tîpên Tirkî", Xal 2- Piştî belavkirina vê zagonê, di hemû daîre û saziyên dewletê de, di tevayî şîrket, komele û saziyên taybetî de, wergirtin û kirariya nivîsên ku bi tîpên tirkî hatine nivîsandin, mecburî ye, Xal 4- Serîlêdanên ku ji alî gel ve tê kirin û bi tipên kevin ya bi elîfba erebî hatine nivîsandin, heta 1'ê Hezîranê 1929'an derbasdar e. Ji 28'ê Çiriya Pêşînê 1928'an pê ve levhayên fermî û xusûsî, tabela, agahî, reklam û nivîsînên sînemayê yên bi tirkî û tevayî mevkute, xeyrî mevkute, rojname, rîsale û kovarên bi tirkî, divê bi tîpên tirkî ve bê nivîsandin û çapkirin.

[30] Îddîanameyê ku ji alî Dozgeriya Komarî ve di derhaq ajandayên tirkî û kurdî ku ji alî Baroya Diyarbekirê ve ji bo ji endamên xwe re belav bike hatibû çapkirin.

Ji alî vê pirsgirekê jî tiştên pêwîst ew e ku, divê tîp û dengên ku li tirkî tune ne, li elîfbaya tirkî bê zêdekirin. Tiştê heyî ev e, divê qedexekirinên zagonî yên li ser deng û tîpên ne bi tirkî hene demekî zû bêne rakirin.[31]

13. "Enstîtuya Kurdî" û "Beşa Bingehîna Zanistî ya Ziman û Wêjeya Kurdî": Bi pirsa kurdî ve girêdayî, di dema vebûna kurdî de babetekî din jî, bi taybetî daxwaz û gengeşiyên li ser damezrandina "Enstîtuya Kurdî" û "Beşa Bingehîna Zanistî ya Ziman û Wêjeya Kurdî" li zanîngehan hate rojevê.

Di zanîngehan de ji welatên rojhilatên dûr bigrin heta welatên rojava li ser gelek gel û zimanê wan enstîtu û beşa bingehîna zanistî hene. Li dervayî Tirkiyê, li gelek welatan de saziyên bi vî rengî ku li ser ziman û wêjeya kurdî hatine damezrandin hene; her weha kurdên ku Dewleta Federal ya Iraqê dijîn, di vî warî de bi sazîbûn û perwerdeyekî pêşketî re rûberû ne. Li Tirkiyeyêkî demokratîk de saziyên bi vî rengî, wê ji alî çanda pirhejmariya demokratîk û aştiya civakî ve pêşketinekî mezin derxe holê. Ji bo ku kurd jî beşekî çanda pirhejmariya demokratîk bibin, divê saziyên navkirî bêne damezrandin û bêyî ku bi astengekî re rûberû bibin, bi awayekî çalak bikaribin bixebitin.

Ku li Tirkiyê "Beşa Bingehîna Zanistî ya Ziman û Wêjeya Kurdî" bête damezrandin û dest bi xebatê xwe bike, dikare ew nêrînên neyînî ya li Tirkiyê jî ji holê rake. Her weha lêkolîn, lêgerîn û xebatên li ser ziman, dîrok, wêje, etnografya û bi giştî çand û sosyolojiya kurdî, wê ji alî pêywendiyê bi hemwelatiyên din yê Tirkiyê re jî bibe sedema pêşketinekî û hemwelatiyên kurd jî wê bikaribin xwe ji vî welatî bihesibînin.[32]

Ji tiştên ku heyî zanîn wê de, li Tirkiyê ji alî damezrandina enstîtu û beşên bingehîn ya zanistî ve tu astengiyekî zagonî tune ye.[33]

Ji xwe di vî warî de Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê serî li Saziya Xwendina Bilind kir û daxwaza wî, piştî bi navê "Enstîtuya Zimanên Zindî" hate gûherandin, hate pejirandin. Zanîngehê ku vê daxwaza kiribû, dizanibû ku ji alî nav ve çi astengiyekî mewzûatê tune ye; lê gûherîna nav jî bi me dide nîşandan ku hê di vî warî de berxwedanekî heye û ev berxwedana bi awayekî xurt xwe didomîne. Ji ber vê yekê divê di demekî kurt de li ser vê yekê serrastkirinekî qanûnî bête çêkirin.

14. "Zagona Derhaq Damezrandin û Weşana Radyo û Telewîzyonan" ya bi jimara 3984: Di Zagona Derhaq Damezrandin û Weşana Radyo û Telewîzyonan de ku di xala 4'emîn de wiha tê nivîsîn, "Radyo, telewîzyon û weşanên daneyî, bi gorî bilindahiya huqûqê, rêgezên giştî ya Makezagonê, maf û azadiyên bingehîn, ewlekariya netewî û bi gorî rêgezên ehlaqê giştî, wekî karûbarê hemûyan tê pêkanîn. Di weşanan de zimanê tirkî esas e. Lê weşanên ku bi zimanên çand û zanyariya gelemperî re feydeyê wan heye an jî ji bo fêrkirina van zimanên gelemperî û muzîk û nûçe belavkirinê bi van zimanan jî dikarin weşan bê pêkanîn," di benda 1'emîn de di tarîxa 09.08.2002 de guherînek çêkirin û ev guherîna jimara 24841'ê rojnama fermî de hate belavkirin. Bi vê guherînê ku bi jimara 4771'ê û xala 8'emîn ve di hin zagonan

[31] Av. M. Sezgîn Tanrikulu, TRT 6 û Mafê Karanîna Kurdî, Rojnama Radîkal, 15 Çileya Paşîn 2009.

[32] Beyana çapemeniyê ya Serokatiya Baroya Diyarbekir ku bi tarixa 15.10.2008 û jimara 2008/1360'ê ve bi gorî biryara Rêvebiriya Baroya Diyarbekir ya bi tarîxa 10.09.2008 û jimara 2008/283 hatiye belavkirin.

[33] Zagona Dezgeyên Saziya Xwendinên bilind ya bi hejmara 2809 û xala pêvek ya bi jimara 30 de hukma "Heyeta Wezîran, bi pêşniyarên Saziya Xwendinên Bilind û Wezareta Perwerdeya Netewî, dikare di bin bana zanîngehan de fakulte, enstîtu û xwendingehên bilind damezrîne; dikare van dezgeyan yek bike, bigre, girêdan û navê wan biguherîne. Saziyên ku di girêdana wan de guhertin pêkhatine, bi kadro, xeyrîmenkul û heyiyê xwe ve bêyî ku biryarekî din bê girtin, derbasî zanîngehê din dibe."; Rêgeznameya Saziyên Akademîk ya li Zanîngehan de xala 11'emîn ya bi sernivîsa "Enstîtu"yê de hukma "Enstîtuyên ku li zanîngeh û fakulteyan hatiye damezrandin, saziyên welê ne ku bi gor esasekî zagonî hatine damezrandin û dikarin ji yekî zêdetir beşên zanistiyê de hînkarî û perwerdeya serlîsans, lêkolînên zanistî û nêrîtiyan bikin." Heye. Li Rêgeznameya Saziyên Akademîk ya li Zanîngehan, xala 16'emîn ku bi sernavê "Bingeha Zanist û Bingeha Hunerê" hatiye nivîsandin de, hukma "Bingeha Zanist û Bingeha Hunerê, beşên akademîk in ku herî kêm di yek bingehekî zanistî an jî bingehekî hunerî de hînkarî, perwerde û nêrîtiyan pêkbînin. Ji bo damezrandin an jî girtina Bingeha Zanist û Bingeha Huneran, rasterast an jî piştî pêşniyara zanîngehan, Rêvebiriya Xwendina Bilind dikare biryar bide." Heye.

de guherîn pêk anî bû hukmekî din li zagona navkirî zêdekir û zagon bi vî awayî hate guhertin: "Ji alî din ve bi ziman û zaravên kevneşopî yên ku hemwelatiyên tirk jî di jiyana xwe ya rojane de bikartînin, dikarin weşan bê çêkirin. Lê ev weşanên han nikare dijberiya rêgezên Komarê ku li Makezagonê hatine nivîsîn û ji yekaparîbûna dewletê ya bi gel û welatê xwe re, bike. Esas, karanîn û venerîna van weşanan, bi rêgeznameyekî ku ji alî Dezgeya Bilind ve hatiye derxistin, tê sererastkirin."

Lê piştî vê zagonê Serokatiya Dezgeya Bilind ya Weşanên Radyo û Telewîzyonê rêgeznameyekî amadekir û rewşekî welê derket ku çi kes nikaribû dijberî vê rêgezê weşanan bike.[34] Bi vê rêgeznameyê ve her çiqas di zagonê de tiştekî welê tune be jî mafê weşanê tenê dan TRT'ê (Dezgeya Radyo û Telewîzyonên Tirkiyê). Ji alî din ji naverok û demê weşanê re sînor jî danîn. Piştî ku ev rêgezname hate pejirandin rêvebiriya TRT'ê serî li dadgehê da û bi sedema ku saziya TRT bi zagonekî taybetî hatiye damezrandin û Dezgeya Bilind ya Weşanên Radyo û Telewîzyonê nikare weşanên wî saz bike û wezîfe bide wî, doz vekir û ji dadgehê daxwaz kir ku ev rêgeznameyê ji holê rake. Dadgeh, daxwaza TRT'ê bicîh de dît û rêvebirina vê rêgeznameyê da rawestandin. Baroya Diyarbekir jî her di eynî babetê de doz vekir, lê dadgeh biryar da ku ehliyeta wî têrî dozê nake, doza wî hate redkirin.[35]

Piştî ku zagon bi rêgeznameyê ve hate bişaftin û berxewdana TRT'ê ya li hember weşanên bi zimanên din neşikiya, di zagona bi jimara 3984'an de ku bi navê Zagona Derhaqa Damezrandin û Weşanên Radyo û Telewîzyonan tê zanîn, guherînekî bi zagona 4771'ê hate çêkirin. Ev guherîna ku hevoka çaremîn ya zagonê, xala 4'emîn, benda 1'ê diguherîne, di tarîxa 19.07.2003'an de jimara 25173'ê rojnama fermî de di bin navê zagona jimara 4928'ê, ku di hin zagonan de guherîn pêk tîne, bi xala 14'emîn hate belavkirin. Piştî guherînê zagon bi vî awayî hate nivîsandin: "Ji alî din, saziyên radyo û telewîzyonên dewletî û taybetî de jî ziman û devokên kevneşopî yên ku hemwelatiyên tirk di jiyana xwe ya rojane de bikartînin, dikarin weşan bê çêkirin."

Piştî vê serrastkirinê jî bi riya rêgeznameyên Serokatiya Dezgeya Bilind ya Weşanên Radyo û Telewîzyonê, li ber dezgeyên weşanî hin asteng çêbûne û naveroka weşanê, demê wî û saziyên ku bikaribin weşanê bike bi rêgeznameyê ve hatine xetimandin.[36]

---

34 Di Rêgeznameyê ku roja 18.12.2002'an li jimara 24967'ê rojnama fermî de bi navê "Rêgeznama li Derhaq Zimanê Weşanên Radyo û Telewîzyonê" hat belavkirin de, xala 4'emîn û bendên 2'emîn, 3'emîn û 6'emînê xala 5'emîn de, di bin sernavê "Zimanê Weşanan" de û xala 4'emînê rêgeznameyê ku ji dadgehê bişaftina wî hatiye daxwazkirin de wiha tê nivîsîn: Divê weşan bi tirkî bêne çêkirin. Divê di weşanan de taybetmendiyên tirkî û rêgezên wî neyê xerakirin û wekî zimanê devkî û bi amanca pêşvebirinê wekî zimanê çand, perwerde û zanistê bête bikaranîn."

Beşa rêgeznameya "Weşanên Ziman Û Zaravên Kevneşopî Yên Ku Hemwelatiyên Tirk Jî Di Jiyana Xwe Ya Rojane De Bikartînin" de ku ev rêgezname ji dadgehê hatiyê daxwazkirin ku ji holê bê rakirin, ango di xala 5'emîn, benda 2'emînê vê rêgeznameyê de wiha tê gotin: Weşana ziman û zaravên kevneşopî yên ku hemwelatiyên tirk jî di jiyana xwe ya rojane de bikartînin, ji alî TRT'ê ve tê çêkirin."

Rêgeznameyê ku li jor behskirî de, di benda 3'emînê xala 5'an de wiha hatiye nivîsîn: Di weşanên muzîk û çandî de yekm an jî ji yekî zêdetir ziman û zaravê ve weşan têne çêkirin. Lê ji bo hînkirina van ziman û zaravan weşan nayêne çêkirin."

Hevoka ewil ya vê rêgeznameyê ku di xala 5'emîn û benda 6'e de hatiye nivîsîn: Weşanên ku bi van ziman û devokan tên çêkirin di radyoyan de rojê 45 û heftiyekî de ji 4 saetan zêdetir, di telewîzyonan de jî rojê sî deqîqeyan, heftiyekî de jî ji 2 saetan zêdetir weşan nayêne çêkirin."

[35] Rêvebiriya Giştî ya Daîra Darizandinên Rêvebirina îdarî, Bingeh: 2003/511 Biryar jimara 2004/13 û biryara bi tarîxa 15.01.2004.

[36] Rêgeznameya ku bi navê di "Weşanên Ziman Û Zaravên Kevneşopî Yên Ku Hemwelatiyên Tirk Jî Di Jiyana Xwe Ya Rojane De Bikartînin" de di xala 4, 5 û 6 de û xala yekemîn ya muweqatî ku ji dadgehê bişaftina xala 4'emînê wî hatibû daxwazkirin de di bin sernavê "Zimanê weşanan" de wiha tê gotin: "Divê weşan bi tirkî bêne çêkirin. Divê di weşanan de taybetmendiyên tirkî û rêgezên wî neyê xerakirin û wekî zimanê devkî û bi amanca pêşvebirinê wekî zimanê çand, perwerde û zanistê bête bikaranîn. Her weha ji bilî tirkî bi ziman û zaravekî din çêkirina bername qedexe ye. " Beşa rêgeznameya "Weşanên Ziman Û Zaravên Kevneşopî Yên Ku Hemwelatiyên Tirk Jî Di Jiyana Xwe Ya Rojane De Bikartînin" de ku ev rêgezname ji dadgehê hatiyê daxwazkirin ku ji holê bê rakirin, ango di xala 5'emîn, benda 2'emînê vê rêgeznameyê de wiha tê gotin: Weşana ziman û zaravên kevneşopî yên ku hemwelatiyên tirk jî di jiyana xwe ya rojane de bikartînin, ji alî TRT'ê ve tê çêkirin." Rêgeznameyê ku li jor behskirî de, di benda 3'emînê xala 5'an de wiha hatiye nivîsîn: Di weşanên muzîk û çandî de yekm an jî ji yekî zêdetir ziman û zaravê ve weşan têne çêkirin. Lê ji bo hînkirina van ziman û zaravan weşan nayêne çêkirin."

Piştî ku ev rêgezname hate weşandin, ji ber ku îcaza weşanên herêmî û lokal bi profîla temaşevan û guhdarvanan ve hatiye girêdan û ev 5 sal e jî ev profîl nehatiye derxistin, di vî warî de jî çi gavekî nehatiye avêtin, li hember zagonê, rê li ber weşanên bi zimanên din dîsa hatiye xetimandin.

Ji bo ku weşanên taybetî bikaribin bi zimanên netewî, herêmî an jî lokal weşanan çêbikin, divê ev rêgeznameyê ku bi awayekî vekirî dijberiya zagon û Makezagonê ye, ji holê bê rakirin.

15. "Zagona Radyo û Telewîzyonên Tirkiyê" ya bi jimara 2954: Di vê zagonê de li beşa weşanên ji Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê de tê gotin ku, "Dezgeya Radyo û Telewîzyonên Tirkiyê dikare xebatên Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê bi awayekî bêlayen û bimîzan, biweşîne. Her weha Dezgeya Radyo û Telewîzyonên Tirkiyê dikare ji civînên Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê (wekî vekirin, sondxwarinê), weşanên zindî bike. Dezge di vî warî de bi peyrewa navxweyî ya Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê ve girêdayî ye." Ev hukmê han bi zagona di tarîxa 11.06.2008 û bi jimara 5767'ê ve ku bi navê Guherînên Di Derhaq Zagona Radyo û Telewîzyonên Tirkiyê û Zagona Damezrandin û Weşanên Radyo û Telewîzyonan, hate guherandin. Di xala 6'emînê vê zagonê de, sernivîsa xalê jî tê de guherîn hatin çêkirin.[37]

Bi vî serrastkirinê ve ji TRT'ê re jî îcaza weşanên bi ziman û zaravên din jî hate dayîn. Berî ku di zagonê de ev guherîn çêbe jî TRT dikaribû vê weşanê bike. Lê piştî van guherînan, incax di 01.01.2009'an de TRT Şeş dest bi weşanê kurdî kir. Ev weşanên ku jê re aboriyekî jî divê wê daîmî be, ango ne daîmî be, çi yeqînîyekî wî tune ye. Diviyabû ev zagona ji bo daîmîbûnê ji rêvebirên TRT'ê çi rê nehiştiba û bi awayekî yeqîn û sererast vê wezîfeyê wekî wezîfeyekî hemûyî bihatana nivîsandin.

16. "Zagona Partiyên Siyasî" ya bi jimara 2820: Hukmên ku li Zagona Partiyên Siyasî ya bi jimara 2820'an, xala 43'emîn de tê nivîsîn ku partî di çalakiyên xwe de ji bilî tirkî tu ziman û nivîsekî din nikare bikarbîne, di xala 81'an de jî tê nivîsîn ku partî nikarin îddîa bikin ku ji alî olî an jî netewî, çandî, mezhebî an jî nijadî û zimanî ve kêmayetî hene, her weha ji bilî ziman û çanda tirkî pê ve nikarin ziman û çandên din biparêzin, pêşbixin û belavbikin û bi van hewldana nikarin amanca xerakirina yekîtiya gel biparêzin û çalakiyên bi vî rengî nikarin pêkbînin, di nivîsînên peyrew û bernama xwe de, di civînên xwe yên salonê vekirî û girtî de, di xwepêşandanan de, propagandayê de ji zimanê tirkî pê ve nikarin zimanekî din bikarbînin, hê jî li ser hukum e û tê bikaranîn.[38]

Hevoka ewil ya vê rêgeznameyê ku di xala 5'emîn û benda 6'e de hatiye nivîsîn: Weşanên ku bi van ziman û devokan tên çêkirin di radyoyan de rojê 45 û heftiyekî de ji 4 saetan zêdetir, di telewîzyonan de jî rojê sî deqîqeyan, heftiyekî de jî ji 2 saetan zêdetir weşan nayêne çêkirin."

Xala 6'emîn benda (a) ya rêgeznameya ku di bin sernavê "Serlêdan" de wiha hatiye nivîsîn: Weşanên radyo û telewîzyonên hemû û yên taybetî; ziman an jî zaravê ku dixwazin pê weşanê bikin, naveroka bernameyên ku bi van ziman û zaravan ve pêkbînin, di nav weşanên rojane de cîhê van bernameyan, plana mehane û salane ya van bernameyan, divê bi tevî biryara rêvebiriya saziyê bi nivîskî bidin Dezgeya Bilind.

Xala muwaqet ya 1'emîn ku di bin sernavê "Hukmên Din" de hatiye belavkirin de jî weha hatiye nivîsîn: "Heta ku profîla karanîna ziman û zaravên hemwelatiyên tirk ku di jiyana xwe ya rojane de bikartînin were amadekirin, weşanên ku bi van ziman û zaravên hemwelatiyên tirk ku di jiyana xwe ya rojane de bikartînin tên kirin, dikarin tenê saziyên weşanî yên dewletî û taybetî yên ku weşana xwe bi giştî diweşînin, çêbikin.

[37] Di serrastkirina zagona jimara 5767 xala 21'emîn de, ango zagona bi navê "Weşanên Meclîsa Mezin Ya Gel Ya Tirkiyê, Weşanên Perwerdeya Vekirî Û Weşanên Bi Amanca Hînkirin Û Perwerdeyê Tê Çêkirin Û Weşanên Din" de, ku di tarîxa 26.06.2008'an de li rojnama fermî jimara 26918'an de hate belavkirin, wiha tê nivîsîn: "Saziya Radyo û Telewîzyona Tirkiyê, xebatên Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê ji radyoyê bi awayekî mîzankirî û bêlayen dide. Qenalê telewîzyonê ku bi navê TRT 3 ji dezgeyê re hatiye tahsîs kirin, ango bi riya TBMM TV'yê, xebatên Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê tê weşandin. Wê esasên xebatên Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê çawa bê nîşandan, bi hevşîrîkiya serokatiya Meclîsa Mezin ya Gel ya Tirkiyê û Rêvebiriya Giştî ya Dezgeya Radyo û Telewîzyona Tirkiyê ve wê bi protokolekî bête amadekirin. Ji bo van weşanan çi xercekî naye stendin. Weşanên perwerdeya vekirî û weşanên bi amanca hînkirin û perwerdeyê tê çêkirin, ji qanalekî ku Dezgeya Radyo û Telewîzyona Tirkiyê re hatiye tahsîskirin ve, tê meşandin. Xerca weşanê û tiştên pêwîst yên ji alî weşanê, di navbera saziyan de bi protokolekî tê meşandin. Ji alî dezgeyê ve ji bilî tirkî bi zimanên din jî weşan tê çêkirin."

[38] Zagona Partiyên Siyasî ya bi jimara 2820 ku di tarîxa 24.04.1983'an de li rojnama fermî ya bi jimara 18027'an de hatiye belavkirin:"Xal 43- Pêşendamên namzet, ji bilî tiştên li bernameyê partiyê hatiye nivîsîn, an jî ji biryarên kongreya mezin û ji biryarên rêvebiriyên navendî cûdatir, li derhaq kar û barên giştî-netewî, herêmî an jî nikare pîşeyî tu weadekî din bide û ji zimanê tirkî pê ve nikare zimanekî din bikarbîne." "Xal 81-

Di zagona partiyên siyasî de ji bilî van serrastkirinên navkirî, gelek serrastkirinên qedexeyî hene. Tiştê pêwîst ne tenê serrastkirina ev her du xalên ku hatine binavkirin e, divê zagon ji binî ve bê guherandin.

17. "Zagona Hukmên Bingehîn ya Hilbijartinan û li Derhaq Peyîrkên Hilbijêran" ya bi jimara 298: Bi gorî zagona jimara 298, xala 58'emîn, di weşanên propagandayê hilbijartinan de ku di radyo û telewîzyonan de tête weşandin, ji bilî tirkî karanîna zimanên din hê jî qedexe ye.[39]

Ji alî vê zagonê ve jî tiştên pêwîst ew e ku, hukma ku niha nayê bikaranîn divê bêyî ku rê û olaxên din derxe holê, bête rakirin.

18. "Zagona di Derhaq Dezgeyên Aborî de Karanîna Zimanê Tirkî ya Mecburî" ya bi jimara 805: Zagona bi jimara 805'ê xala 1'emîn de hê jî pêywendiyên di navbera kesan de (muamele, mukavele, muhabere) karanîna tirkî mecbûrî ye û zagon hê jî tê bikaranîn.[40]

Vebûna demokratîk ku divê mirov bi awayekî serhev lê bifikire, dibe ku sibe bi riya hin zagonan bibe asteng. Ji ber vê yekê zagonên bi vî rengî ku wê sibe çawa bête bikaranîn nayê zanîn, divê di rojevê de be.

Encam

Di vê nivîsê de di derhaqa vebûna demokratîk de bi hin mînakên kurt pêşniyarên pêwîst hate bizimankirin. Bêgûman gavên bên avêtin, ne tenê ev in. Yên hatine pêşniyarkirin, ji alikariyê re vekirîne. Ev pêvajoyê ku em tê de ne carekî din jî bi me dide nîşandan ku, "**em di gavavêtinê de tiştên ku ne pêwîst in pêktînin, lê di tiştên pêwîst de jî pêknaynin,**" pispor in. Ji bo ku vebûna demokratîk bi mane be, bêyî ku şika me jê hebe divê projeyekî demokrasiyê bi awayekî biryardarî bête rêvebirin. Di vî warî de beyî ku hêvî û bawerî kêm bibe, pêvajoya lihevkirin û aştiyê, divê bi nirxên huqûq û edaletê ve di jiyanê de ciyê xwe bigrin.

Partiyên siyasî: a) Nikarin îddîa bikin ku li ser axên Komara Tirkiyê de ji alî olî an jî netewî, çandî, mezhebî an jî nijadî û zimanî kêmayetiyekî din heye. b) Ji bilî ziman û çanda tirkî pê ve nikarin ziman û çandên din biparêzin, pêşbixin û belavbikin û bi van hewldana nikarin amanca xerakirina yekîtiya gel biparêzin û çalakiyên bi vî rengî nikarin pêkbînin. c) Di nivîsînên peyrew û bernama xwe de, di civînên xwe yên salonê vekirî û girtî de, di xwepêşandanan de, propagandayê de ji zimanê tirkî pê ve nikarin zimanekî din bikarbînin; pankart, levha, plak, hacetên dengî û dîtînî, broşur û beyannameyên ku bi zimanê tirkî nehatine nivîsandin, nikarin bikarbînin û belavbikin; her weha nikarin kesên ku van kiryarana pêktînin re bêdeng bimînin. Lê tenê bername û pêyrewên xwe dikarin wergerînin zimanên ku ji alî zagonan ve nehatine qedexekirin."

[39] "Zagona Hukmên Bingehîn ya Hilbijartinan û li Derhaq Peyîrkên Hilbijêran" ya bi jimara 298 ku 02.05.1961'an de li rojnama fermî jimara 10796'an de hatiye belavkirin de wiha tê nivîsîn: "Xal 58- Li ser agahiyên desta ku ji bo propagandayê tête bikaranîn de û her weha matbûatên din de, şiklê ala tirkî û bikaranîna nivîsên olî qedexe ye. Di weşanên propagandayê hilbijartinan de ku di radyo û telewîzyonan de tête weşandin, di propagandayên din yê hilbijartinan de, ji bilî tirkî karanîna zimanên din qedexe ye.

[40] "Zagona di Derhaq Dezgeyên Aborî de Karanîna Zimanê Tirkî ya Mecburî" ya bi jimara 805 ku di tarîxa 22.04.1926'an de li rojnama fermî ya bi jimara 353'an de hatiye belavkirin de wiha tê nivîsîn: Her sazî û şîrketê ku bi tabiyeta Tirkiyê hatiye damezrandin, di daxilî Tirkiyê de mecbûr in ku mukavele, muamele, muhabere hisab û defterên xwe bi tirkî bigrin. http://www.mevzuat.adalet.gov.tr/html/405.html.